



TÊKOŞER



hêmar:22

sal:1983



REVUE TRIMESTRIELLE

DRIEMAANDELIJKS BLAD

TÊKOŞER

TÊDAYÎ (İÇİNDEKİLER)

Rûpel Nivîsar
(Sayfa) (Konu)

- 2..... Ji bo aşîti.
- 4..... Generalîlerin gûzmece se-
ginleri.
- 5..... Ortak bildiri.
- 6..... Nopram.
- 7..... Belçika navên Kurdî pe-
jirana.
- 9..... 19 roj grêv li Belçika.
- 10..... Firoka Kurdistan. Torî.
- 12..... Pamezrana Kurdî. Torî.
- 15..... Kurdistan'dan mektup.
Protokol.
- 16..... Cegîci kadrolar ûzerine.
- 17..... Sebûn Sebûn. P.Patte.
Nema. Torî.
- 18..... Mebata me.
- 20..... Têkoşer'den haberlar.
- 23..... Kuçê Fûzîk.

TEKOŞER: Kovara Têkoşer
Yekîtiya Karker û Xwendekarên
Kurd li Belçika

TEKOŞER: Belçika'daki Kürt İsci ve
Öğrenciler Birliđi

Het Blad van Koerdische Arbeiders en
Studentengemeenschap in België

Berpîrsfiyar/Sorumlusu
Verantwoordelijk Uitg. M.NEZİH YALÇIN

Navnîşan/Adres: TEKOŞER - B.P.33
1730 Zellik - BELGIQUE

Bûha/Fiyatı/Prijs: 40 Bfr, 2 DM, 6 FFR

Şerten Abonetîye: 480 Bfr

Hejmara Bank
Bank(a) Hesap No: TEKOŞER 426-344.011-85
Kredietbank - Belgique

Jİ BO AŞÎTÎ

Dijî Çekên Atomê

Di meha cotmehê de, di hemû welatên
Awrûpa Rojhilat de, rêveçûnên (me-
şînên) pîr mezin çêbûn, diji çek-
darîyê û ji bo aşîtiyê. Roja

Yekşemê, di 23/10/1983 de, li
Bruxelles, nêzîkî 400.000 meriv ji
her dîtin û her sîyaset di kuçan de
rêve çûn. Bi mehan berê vê tarîxê
jî gelek komel civîn û axaftin, di
gelek beledîyan de kirin ji bo ku
gelên Belçika armanca vê rêveçûnê
baş zanibin. Di sala 1981 de jî li
Belçika û welatên Ewrûpîyên din de
ji bo vê armançê, rêveçûnên mezin
çêbû bûn.

Ji bo ku em tehlîla vê rêveçûnê bi-
kin, pêwîste ku em sedema rêzana
çekdarîya NATO zanibin. Ji aliyê dî-
rokî de, em karin, bi kurtî hebûn û
pêşveçûna çekên atomê binin bîra
xwendevanan:

-Heta sala 1949, tarîxa avakirina
NATO, Amerîka monopolê çekên atomê
di destê xwe de digre, û wan, bi heza-
nî, li Ewrûpa datîne.

Di sala 1957 de Sovyet rakêtên Ji
bo nîşanên dîr ku digihêjin nîşan-
ên dîr, anga Amerîka û Ewrûpa, der-
dixîne.

-Di sala 1959 de, ji bo ku dijî ra-
kêtên Sovyet derkeve, NATO li İngi-
lîstanê, Îtalya û Tirkiye rakêtên
Thor û Jupiter, ji bo nîşanên orte
destpêdike derxistinê. Di wî zemanî
de jî Sovyet rakêtên SS4 û SS5 der-
dixîne. NATO jî 200 " Serên " atom
di bin derîyayê de, li Ewrûpa bi
cîh dîke.

-Di sala 1977 de, Sovyet rakêtên
SS20 ên nuh derdixîne. NATO jî li Ew-
rûpa hejmara 200 " serîyên " atom bi-
lind dîke û digihêne 400 (Polaris
û paşê Poseidon)

-Di sala 1979 de, NATO dijî SS20 ên
sovyet, du biryar distîne: eger Ame-
rika û Sovyet, di dan û stendinên
xwe li ser çekên atom li bajarê Ce-
nevre, li Îsvîçre, li hev neyên, e-
wê NATO, di dawîya sala 1983 de, li
Ewrûpa rakêtên atom, anga, 572 Pers-
hing-2 û Cruise. bi cîh bike.

-Di sala 1982 de, li Cenevre, Sovyet
pêşneyarekî anî: eger NATO Pershing
2 daneyne û tenê 75 rampayên Cruise
(dêlva 116) deyne, ewê Mosko hej-
mara SS20 bixîne heta 75 (Sovyet

243 SS20 ber bi Ewrûpa û 108 ber bi Çîn danîye.) Lê Amerîka ew pêşneyar qebûl nekir. Reagan xwest hemû SS20 rabin. Lê em zanin ku eger NATO Pershing-2 û Cruise daneyne jî, li Ewrûpa çekên atomê yên ku hene têrî şere kî pirr mezin û di çend deqqan de şe witandina hemû Ewrûpa dikin. Armanca Amerîka ew e ku bi danîna Pershing-2 û Cruise ew karibe, ne ji erdê xwe, lê ji erdên din, ango Ewrûpa, Sovyet xerabike; ji bo ku ew zane SS20 or-te ne karin bigihêjin Ewrûpa, lê nîkarin bigihêjin Amerîka. Ji alîkî din jî, em zanin ku rakêten dūr ên Amerîka û Sovyet hene û karin, bê ku li Ewrûpa xin, bigihêjin erdên hevdu. Bi kurtî, em dixwazin bêjin ku danîna Pershing-2 û Cruise li Ewrûpa tehlîkekî mezin e ji bo jîna cîhanê û aşîtiyê. Weka ku me li jor de got, çekên atomê ku nuha li ser erdê Ewrûpa hene karin, bi xwe tenê SS20 xerabikin û ew ne muhtacên Pershing-2 û Cruise in. Ji alîkî din jî, rewşa Ewrûpa girêdayî hemû welatên dinyayê ye. Heta ku mêtîngêhî û emperyalîzm ji ortê ranebe, tehlîka şer, kuştin û şewitandin ewê her gav mezintir bibe. Armanca me ew e ku di hemû cîhanê de çek rabin û kapîtalîzm û emperyalîzm hilweşin û cih bidin sosyalîzmê û aşîtiyê.

3. Caractéristiques des Euromissiles contestés

7 minutes
1.800 km
U.S.A. EUROPE

20 minutes
5.000 km
U.S.A. EUROPE

4 heures
2.500 km
U.S.A. EUROPE

Christian Daclier
Collaborateur du GRIP

● Les Missiles de croisière
Ces « Ground Launched Cruise Missiles » (missiles de croisière basés à terre) ont en fait une version élaborée des avions sans pilote allemands de la seconde guerre. D'une longueur de 5 mètres environ, le « cruise » vole à très basse altitude et à une vitesse proche de Mach 1. Un affût radar mesurant constamment le profil du terrain survole et le compare avec celui programmé dans l'ordinateur. Ce lors il lui permet de maintenir sa faible altitude et d'échapper ainsi à la défense antiaérienne adverse. Son coût, peu élevé par rapport à d'autres armes du même genre paraît-il est évalué à 30 millions de \$ par pièce. Il en sera produit 464 dont 48 devraient être déployés en Belgique.

● Les Pershing II
 Successeur du Pershing I dont la portée ne dépassait pas 700 kilomètres, ce missile balistique pourra effectuer 1800 kilomètres tout en maintenant une grande précision de trajectoire: une ogive manœuvrable à guidage terminal permettra sa rentrée dans l'atmosphère à l'endroit prévu tandis qu'un radar relevant l'image du site d'impact et la comparant avec celle mise en mémoire dans l'ordinateur de bord corrigera sa trajectoire finale. Les 108 Pershing II, dont l'implantation est uniquement prévue en Allemagne occidentale, seront montés sur une double rampe de lancement mobile.

● Les SS-20
 Missile sol-sol soviétique équipé de trois ogives nucléaires et portant à environ 4500 kilomètres. On évalué le « parc » actuel de SS-20 à 200 exemplaires environ, dont la moitié sont déployés dans la partie occidentale de l'URSS. Ils sont destinés à remplacer les missiles SS-4 et SS-5 construits dans les années 60 et qui sont beaucoup moins précis.

Li Belçîka, bû çend sale, qanûnekî ji bo merivên bê kar, lê ên ku ji berê karkirine û perê bê kariyê distînin, derketîye: Van merivan, eger karekî li ba komelekî yan daîrekî ku perê wê tunnebe ji bo wan bide karkirin dîtin, hikumet, ango wezaretê kar, karê qebûl bike ku vî karî bistînin û perê wan (maas) ev wezaret bi xwe dide. Lê ev kar zû bi zû û bi sivikî çênabe. Pêwîste ku, berê her tiştî, ev komel yan daîre projekî ji bo salek yan şeş meh pêşkêşî wezaretê kar bike. Di vê projê de, hemu xebatên xwe ên ku dixwaze bîne serî divê bi awakî pirr vekirî, bîst nivîsandin, û hejmara merivên ku dixwaze bide karkirin û celeb (cinsê) xebata ku her yek ji wan ewê bike bê nasîkirin. Piştî çend mehan hikumet bersîva xwe dide: yan belê, yan na. Eger bersiv baş be komelê kare meri-

vên ku ew nasdike, ên perê bê kariyê distînin, pêşneyar bike, lê sîfetên van merivan divê li gora şertên projê bin. Eger nasên wê tunne bin, komelê kare ji wezaretê merivên ku van şertan dadigrin bixwaze. Ev qanûn (zagon) ne xerab e. Lê gava ku em wê baş dikolînin (tehlîl dikin) em dibînin ku ev yek ji qanûnên krîza aborî ya mezin e: armanca wê nisbêta bê kariyê li Belçîka nîzîm bike, lê karê ku van bêkaran dibînin ji bo salekî tenê ye, ango bîngeha wî ne xurt e. Piştî salekî, pêwîste ku ev komelê projekî din pêşkêş bike. Qelsiya vê qanûnê çî gas be jî fîrsetekî mezin da komela me ku ji roja hebûna xwe, ango di dawîya 1978, heta nuha xebata xwe di warên pirr giran de ajo-tîye. Ev zorî jî, weka ku hemu komelên me zanin ji kêmasiya diravî tê. Ji bo vê yekê, me ka dumahî li rûpela 4. de ye.

Jİ BO AŞTÎ

Ji rûpela 3.

rên xwe êvaran û di rojên dawî-ya heftê de kirîye û me giranî ya xwe daye xebata rêzanî (sî- yasî) : Danaskirina pîrsa Kur- distanê li Belçîka, dan û stan- din bi komelên pêşverû ên Bel- çîkî û bîyanî re, rêveçûn (me- şîn), raxistina pirtûkan di

şev û rojên piştgirtiyê de, kovara me ya sê mehî, folklor, nivîsandina nivîsaran di rojname û kavaren Belçîkî de..

Ji tune-bûna dirav, me nikarî bû xebata xwe ya çandî û civakî (sosyal) fireh biki- ra. Ji bo vê yekê me ji vê qanûna jorîn kar- kir ku em xebata xwe, bi hêzanî ya çandî û civakî, di demekî dûr û dirêj de û bi awa- kî kûrtir, bînin çih.

Di tarîxa 17/10/1983 de sê hevalan dest bi kar kir: didu ji wan Kurd in yek jin, yek mîr, û yê sîsiya jî Belçîkî ye û jin e. her roj komel ji seet 9 heta 17 vekirî ye. Berna- ma ku me pêşkêşî wezaretê kiribû û a ku me pê destpêkir ev e.

a. Alîkarîya civakî (sosyal) : her meriv, Kurd be yan ne Kurd be, kare her roj, paş nîvro, we- re û pîrsên xwe ên giran, weka mafên li Bel- çîka mayîn, li belediya de weydbûn, stendina perê nexweşiyê, bêkarîyê....

Em ji van pîrsan re, yan bi tenê, yan ji bi a- lîkarîya daîrên mûtehasîs, pîr çaran çare dibînin. Eger em çare nebînin jî, ji destê me çikas bê em mafên wan ji wan re tînin ghiştin (fêmkirin).

b. Dan û stendin bi malbatên kurd re.

c. Hînkirina zîman (jin û mîr bi hev re)
Kurdî, Fransîzî, Flamanî.

Her zîman di heftê de du çaran û di her çar- du seet , tê hînkirin.

d. Ji bo zarokan : her çarşem, paş nîvro, ji seet 14 heta 16 :

- Alîkarî di dersên zor de (bi hêzanî di zi- manê Fransîzê de)

- Hînkirina zîmanê Kurdî, Fransîzî, Flamanî

- Hînkirina govend û stranên Kurdî.

e. Di heftê carek : Xebata jinan: hînkirina Fr nsîzî, dirûn, axaftin li ser pîrsên giran

f. Hînkirina folklor û mûzîka Kurdî (Ji me- zînan re)

g. Belavkirina pirtûk, kovar û dokûman li ser çand û dîroka Kurdistan.

h. Weşandina kovara me

i. Weşandina broşûrekî piçûk, bi Fransîzî û Flamanî.

j. Çivînen mesûlên komelê, ji bo tehlîlkirin û firehkirina xebatê.

Di dawiyê da, pêwîste ku em bînin bîra we ku xebata rêzanî ku me li jor got ewê, weka berê bajo, bi alîkarîya hemu hevalan.

Em hêvîdarin ku bi rehberîya pêşneyar û krî- tîkên xwendevanên me emê gavekî din di xeba- ta xwe ya dûr û dirêj bavejin û bi vî awayî ji gelê xwe yê bindest re bi kêr bînin.

GENERALERIN DÜZMESE SEÇİMLERİ

6 Kasım'da politikanın kitlelere yasak landığı, mevcut demokratik hakların gaspedildiği, sendikal harekete gem vurulduğu, işçi sınıfı temsilcilerinin yargılandığı, barışı savunan insanlara ağır cezalar verildiği bir ortamda hal- ka sandık başına gidip oy kullanma fer- manını yayınladılar.

Seçim öncesi başlatılan hazırlık döne- minde kurulan partiler yasaklandı. Yüz- lerce bağımsız milletvekili adayı veto edildi. 2 general ve Faşist Cunta'nın ekonomi mimarı Turgut Özal'ın partileri, paşalardan olur alarak seçime katıldı- lar. Ecevit ve Demirel'den yeşil ışık alan SODEF ve Doğru Yol partileri tüm çabalara yaranmalara rağmen seçim- lere katılma olurlarını paşaların cebinden çıkaramadılar.

Kenan Evren'nin bizzat desteklediği ve seçim gecesine kadar iktidar partisi gö- züyle baktığı Turgut Sunalp'ın MDP halk tarafından istenmeyen parti ilan edildi. Bu partinin az oy almasının birinci ne- deni, zorla kendisini cumhurbaşkanı il- lan eden Kenan Evren'e senide istemiyor- duk, senden başka aday olsaydı aynı he- zimete senide uğratırdık cevabıdır.

Halk niçin Turgut Özal dedi ?

O Turgut Özal değil midir ki; bugünkü eko- nomik çöküşün başmimarı, IMF'ye Türkiye- yi kiralatan, 24 Ocak kararları kahrama- nı, enflasyon ve işsizliğin sorumlusu, faizleri serbest bırakan, küçük esnaf ve orta tabakayı tekellerin çarkında ö- güten büyük ekonomist...

Evet halk anasını belleyen bu adamı çok iyi tanıyordu. Fakat askerden, ordudan nefretini bu şekilde yansıttı.

Askerler : anamızı belleyen bu adamı da- hi size yeğliyoruz dedi.

Düşünün bu bir Özal değil de, yine eski politikacılardan Ecevit, Demirel, Erba- kan'ın partilerine seçim yasağı konul- masaydı acaba, generaller bundan daha büyük bir şamar Turgut Özal'larıyla be- raber yemiyecek miydi ?

Biz halklarımızın kabaran öfkesinin pat- layacağına inanıyoruz. Ne parlamenter düzenler nede Faşist Cunta Halklarımızın sorunlarına çözüm getiremedi.

İşsizlik , enflasyon, zam , işkence,





baskı, zor, adı geçen iktidarların meyveleridir. Bu meyvelerden tüm halkın nasibini aldığına inanıyoruz. Kürd halkı açısından seçimler : Kürd ulusunun varlığının inkar edildiği, 12 milyondan fazla Kürd'ün iradesi dışında sandık başına götürüldüğü bu ve bundan önceki gelmiş-geçmiş hükümetler döneminde yapılan seçimlerin demokratik olduğunu hiç bir ilerici, devrimci, demokrat savunamaz. Şovenizmin batağında yüzen zavallı insanlardan başka... 1961 anayasasıyla Türk halkına tanınan kısmi demokratik haklardan yararlanan Kürd aydınları yine Türkiye partilerinde, sendikalarında, demokratik derneklerinde ve çeşitli legal örgütlenme alanlarında kendi varlıklarının inkarı üzerinde kurulan bu örgütlerde yerlerini zaman zaman aldılar. Legal olarak kurulan hiç bir parti ve kuruluşta Kürd ve Kürdistan isimleri hiç bir zaman geçmedi. Kürdistan'ın partileri, öz örgütleri cumhuriyetin başından beri yasaktır. Onun kendi adında haykırması, konuşması söz sahibi olması, temsilcilerini seçmesi olanağı tanınmamıştır. Onun için diyoruz ki, Kürd ulusu açısından bugüne kadar yapılan seçimler anti-demokratiktir. Cumhuriyet hükümetlerinden hak hukuk beklemek, istemek bile doğru değildir. Kürd ulusu ancak özgür Kürdistan'da öz temsilcilerini seçebilir, oyunu iradesiyle kullanabilir. Kürd ulusunun haklarını programlarına

alan illegal Türkiye partileri de her ne kadar " Kürd halkı kendi kaderini ayrı devlet kurma hakkı dahil olmak üzere tayin edebilir " diyorlarsada, bunu savundukları yalandır. Çünkü, onlar her zaman; " bizim istediğimiz şekilde kaderinizi tayin edebilirsiniz " diyorlar veya demeye getiriyorlar. Bir ulus başkalarının istediği şekilde kaderini tayin edemez. Kürd ulusu da sizin istediğiniz şekilde kaderini tayin etmeyecektir. Kendi istediği şekilde tayin edecektir, bu böyle biline... Paşalar neden Kürdistan'dan daha fazla oy aldılar ?

Evet, ulusal baskıdan. Kürdistan'da ulusal baskı vardır, toplu işkence vardır, komando zulmü vardır, cehalet vardır, dini baskı vardır, zindanlarında bile ayrı bir mumamele vardır, fabrikalar yerine bacası tüten ve Kürdistan'ı bir ağ gibi ören karakolları vardır, özel işkencehaneler vardır, Kürdistan'ın diğer üç parçasıyla komşuluk bağları vardır, dikenli teller, mayın tarlaları, sunni sınırlarla ayrılan toprak bütünlüğü vardır, Sovyetlere karşı dikilen modern askeri hava üsleri vardır, Metropole taşınan yeraltı zenginlik kaynakları vardır ve cumhuriyetin üçte iki ordusu vardır, işte bu tabloyu değerlendiren insanların gereken cevabı alacaklarını tahmin ediyoruz.

Kürdistan'daki bu kozmopolitik olumsuzluklara rağmen Faşist Cunta'nın her üç partisine yüzbinlerin HAYIR oyları vardır.



ORTAK BİLDİRİ

Kardeşler, yurtseverler, 6 Kasım'da Türkiye'de göstermelik seçimler yapılacak. Bu seçimlere katılacak partiler belli. Faşist Cunta'nın kendi kurduttuğu üç parti dışında hiç bir partiye seçimlere katılma izni verilmedi. Açıkçası Cunta seçimler aldatmacası ile faşist diktatörlüğüne " parlamenter " bir görüntü verme, militarist-polis devletini kurumlaştırma doğrultusunda bir adım atıyor. Kendi kurduttuğu ve yine kendi seçtiği partiler ve politikacılarla diktatörlüğünü sivil gıysilerle örtmeye çalışıyor. Kürd ulusunun varlığının bile tanınmadığı bir ortamda, ülkemizin en ileri kesimine, işçilere, köylülere, öğrencilere, gençliğe, demokrasiden yana aydınlarla, demokratlara politika yasaklandı.

devamı 6. sayfada.

ORTAK BİLDİRİ

baştarafı 5. sayfada

Bütün bunlar Amerikancı Cunta'nın "demokrasiye dönüş" sözlerinin ne derece yalan olduğunu gözler önüne serdi. Cunta başı Evren, AP; CHP; MSP'lilere bile büyük bir hırsla saldırıyor. Cunta, demokrasi güçlerine yönelik baskılarını da yeni yöntemlerle arttırarak sürdürüyor. Tüm bu gelişmeler bir yandan faşist Cunta'nın halk ve demokrasi düşmanlığını, öte yandan da korku ve zayıflığını, yalıtılmasını gösteriyor.

Cunta'nın seçimler manevrası, halkı ve dünya kamuoyunu aldatmak, zulüm düzenini sürdürmek için hazırlanmış bir sahtekarlıktır. Bu sahtekarlığa aldanmayalım. Uluslararası düzeyde emperyalist güçlere dayanan cuntanın yalıtılması hızlanıyor. Demokrasiye geçiş balonları birer birer sönyüyor. Bu gelişmeler yurt dışında Türkiye ve Türkiye Kürdistan'ı demokrasi güçleriyle dayanışma savaşımı verenler için yeni olanaklar sağlıyor. Türkiye'deki askeri yönetimin bölge ve dünya barışı için gittikçe ciddi bir tehlike haline geldiği bu günlerde birlikte olmak her zaman kinden daha fazla önem kazanıyor.

Kardeşler,
Demokrasi günleri gelecektir. Amerikan üslerinin yerinde altın başaklı buğdaylar boy verebilir.. İşsizlik, pahalılık, işkence, zulüm son bulabilir. Şehitlerimizin kanlarıyla sulanmış vatan toprakları Amerikan boyunduruğundan kurtulabilir. Gurbetçi işçilerimizin binbir derdine derman bulunabilir.

Gümrük kapılarında çekilen çileler ve rüşvet, bedelli askerlik adı altında gençlerimizin soyulması bitebilir. Bunların hepsi olacaktır. Bunun için ilk adım : Türkiye'de 6 Kasım'da yapılacak düzmece seçimlerin mahkum edilmesi.

Cunta'nın yıkılarak yerine demokratik bir iktidarın kurulması için, Demokrasiden yana herkesin elele vermesidir.

Demokrasi için birleşelim.

Biz aşağıda imzası bulunan örgütler : Belçika'lı, Türk, Kürd tüm demokratları Türkiye'deki düzmece seçimleri protesto mitingine katılmaya çağırıyoruz.

DİB-BK (Demokrasi için birlik-Belçika Komitesi)

BTİB (Belçika'daki Türkiye'li İşçiler Birliği)

TEKOŞER (Belçika'daki Kürd İşçi ve Öğrenciler Birliği)

Mitingi destekleyenler ; Devrimci İşçi Partizan.

MİTING 5 KASIM 1983 CUMARTESİ SAAT 14'te

Türkiye Büyük Elçiliğinin önünde

Adres : Rue Jules Lejeunes 74

1060 Bruxelles



DEPREM

Doğal bir felaket olan deprem yine Kürdistan'da, yine binlerce ölü, yüz binlerce evsiz barksız, hayvansız azıllı kışın pençesine terk edilen öküz, çıplak aç çocuklarımız..

Tesadüfen ölmeyen oysaki, yaşadığı her dakika ölen yurtsever talihsiz analarımız, bacılarımız, yavrularımız, insanlarımız...

İnsan oğlu doğaya geldiği günden beri ona savaş açmıştır. Onun kanunlarına hakim olmak istemiş, çoğu keresinde bunu başarabilmiştir. Acımasız doğanın insanoğlu önünde neredeyse diz çöktüğü 20. asrımız. Ve hâlâ doğanın kanunlarına başı eğik ölüme terkedilen insanlarımız.. Evet deprem büyük bir afettir, acımasızdır, sağı, solu, gecesi, gündüzü, dakikası yoktur. Fakat insanoğlunun hünerli elleri, alın teri, emeğiyle yapılan aletler, alınan önlemlerle bugün dünyamızın bir çok yerinde yenilmiştir. Kürdistan'daki kadar gaddar değildir.

Niçin, neden insanlarımızı telef eden bu afet Japonya'da esen bir rüzgarın ağaçların yapraklarını, dallarını sallar gibi okşayıp geçebilmekte, vahşetini, gafletini kaybedip, insanoğlu önünde diz çökmektedir ? Depremlere, ölümlere, kırımlara yabancı olmayan Kürdistan halkını bu acımasız doğa kanununun pençesine terk eden sömürgeci güçler ; asıl katil sizlersiniz....

Kürdistan'ın zenginliklerini talan etmek için kuklası olduğunuz ABD'nin çıkarları için modern hava alanları, askeri üsler ve yollarını yapmak için milyarları harcar milyarları kazanırsınız. 160 F 16 uçağı için 4 milyar doları bir kalemde harcayınız.

Fakat her nedense halkımızın can güvenliği söz konusu olunca, onun barınacağı, korkulu ve dehşetli gördüğünüz depremin, insanlarımızı zarar vermeyeceği bir konutu yapmayı çok görürsünüz.

Evet Varto'da, Erzincan'da, Lice'de Van'da yüzbinleri ölüme terk eden bu düşüncemiz sömürgeci ezen ulus zihniyetinizden kaynaklanıyor.

Halkımız öz iradesine sahip olmadan sömürgeci iktidar, faşist cuntaların politikalarına daha çok kurbanlar verecektir.

Deprem felaketzedeleri;

Ulusunun öz evlatları ancak seni depremlerden, maceralardan, felaketlerden koruyabilir, insanca yaşamak

dumahî li rûpela 24. de ye.



TÊKOŞER

Hajmar 2
29-1-09-119 63...

Union des Travailleurs et Étudiants Kurdes en Belgique
Kurdîşka Artistanan en Studentenvereniging in België
Yekîtiya Karkerên Xwendevanên Kurd li Belçîka
Adresse: B.P. 33 - 1730 MELLE



MINISTRE DES AFFAIRES ÉTRANGÈRES,
DU COMMERCE ÉTRANGER ET DE LA
COOPÉRATION AU DÉVELOPPEMENT

1000 Bruxelles, le 30 SEP. 1983
2, rue Châtré Bossu - TEL. 513.6240.

C18-98. 250/PR
C18-95.60/40

Ministère des Affaires Étrangères
Service de Chancellerie
État-Civil
1, rue du Grand Cerf
1000 Bruxelles

Messieurs,

Nous sommes une organisation culturelle kurde, subsidee par le Ministère de la Communauté Française et qui existe depuis la fin de 1978.

Ci-joint, nous vous envoyons une liste contenant des prénoms kurdes, utilisés couramment au Kurdistan de Turquie, d'Irak, d'Irak et de Syrie et qui sont, souvent, interdits par les autorités de ces pays.

Espérant que cette liste vous soit utile, nous vous prions, Messieurs, d'agréer l'expression de notre considération distinguée.

Le Département des Affaires étrangères
atteste par la présente que le prénom de "Tirêj"
est usité au Kurdistan de Turquie.

Pour le Ministre des
Relations extérieures,
Le Fonctionnaire délégué,



Tan...
R.Y. VAN INNIS.

P. JAMIL
P. JAMIL
Présidente

Belçika navên Kurdî pejirand.

Ji berê Kurdên li Belçîka ne dikarin navên Kurdî li zarokên xwe bikin. Di me, ha îlonê da zarokê ya endamekê me çêbî. Komûna (beledîya) ew li qeyd bûyî ne xwest ku navê endamê me dixwest li qîza xwe bike.

Komûnê (beledîyê) navên Tirkî û Erebiyan bi resmî ji aliyê balyozxanên Tirk û devletên Ereban hatî dayîn danîn li ber hevalê me û jêre gotin: tu dikarî navek ji van navan hilbijêrî û li qîza xwe bikî.

Pêşneyara Beledîyê endamê me demokratîk ne dît û ji wezîrê karên derve û wezîrê karên hindurî re û hinek komelên peşverû dijî nijadperestîyê re name şand. Paş mehekê Têkoşer lîstek navên Kurdî (500 nav) çêkir û wezaretê karên derve şand. Ew lîste hate qebulkirin û ji tevî beledîyên Bruxelles (19) re hate şandin.

Paş vê xebatê, endamê me navê ku dixwest li qîza xwe kir. Ji îro pêda Kurdên li Belçîka dijîn wextê zarokên wan çêbin wê karin bê zorî navên Kurdî bidin zarokên xwe.

Em lîsta navên Kurdî û fotokopiya name ya wezaretê karên derve ji were didin xuyakirin.

Navên Kurdî

A
Abo, Agir, Ano, Arê, Aryan, Aşê, Aşitî, Aşine, Axê, Avdar, Avdel, Avê, Aza, Azad,

B
Babelîsk, Babet, Bado, Badev, Bager, Bahar, Bahoz, Balo, Bapîr, Baqoq, Ba-

ran, Baranê, Barano, Baro, Bazê, Bazo, Befrîn, Behlo, Behrem, Behrûz, Behzad, Belo, Bengî, Bengîn, Beno, Berefş, Berfîn, Berfo, Bermal, Beru, Brexo, Berxwedan, Besê, Besna, Beso, Berzan, Beyan, Beybûd, Beybûn, Bêmal, Bêrivan, Bêro, Bêzar, Bêzê, Bêzo, Binefş, Birîndar, Biskan, Biro, Bişar, Bîyan, Bîyanî, Bîyo, Brûsk, Bokê, Bozan, Bozo, Bûbê,

C
Cangîr, Cango, Cano, Casim, Cebo, Cegerxwîn, Celadet, Celîl, Cemşîd, Ceng, Cengo, Cercûr, Cewher, Cimo, Cino, Cîroro, Ciwan, Cîran, Cotar, Cohtar, Cotkar, Cotyar, Cubar,

Ç
Çalak, Çalo, Çarta, Çeçan, Çekdar, Çeko, Çeleng, Çeleq, Çeleqo, Çelo, Çemo, Çerto, Çeto, Çira, Çiro, Çiya, Çirûsk, Çûro,

D
Dara, Darav, Darîn, Dayîk, Delal, Delo, Dengbêj, Derbas, Derdê, Derman, Dermo, Deştî, Dibo, Diboz, Dijwar, Dilar, Dilaran, Dilêr, Dilbirîn, Dilê, Dilcan, Dilgerm, Dilgeş, Dilîn, Dilo, Dilovan, Dilşah, Dilxwîn, Dimdim, Dirbo, Dirê, Dîla, Dîlawer, Dilber, Dogig, Dotmam, Duwan,

E
Ebdö, Eco, Edê, Edûl, Efo, Egît, Emîs, Endam, Enî, Engo, Erdeşêr, Esmer, Etê, Etman, Eto, Eyaz, Eylo, Eyo, Evanî, Evdo, Evîn, Ezdîn,

Ê
Êkane, Êmin, Êrîş, Êvar,

dumahî li rûpela 8. de ye. 7

ji rûpela 7.

F

Felemez, Fengeno, Feqîr, Ferfûr, Ferhat, Ferho, Ferîdûn, Ferman, Ferxê, Ferxo, Ferzend, Ferzo, Feyzûr, Fincê, Finco, Firar, Firamerz,

G

Gamêş, Garis, Gavan, Gefo, Gelî, Gemşo, Genim, Gerdûn, Gerno, Gewher, Gewrê, Gewro, Genco, Gêrto, Gêso, Gisê, Gîsko, Gîya, Gozê, Guharî, Guhdar, Guhderz, Gulan, Gulazer, Gulê, Gulçîn, Gulistan, Gulîzer, Gulnaz, Gulperî, Gulşah, Gulşênî, Gulşilan, Gulzar, Gundî, Gurgîn, Goran, Guro, Gurzo,

H

Hadî, Hafo, Havîn, Hawar, Hefsed, Hekîm, Helbest, Helê, Helkewt, Hemîn, Hemreş, Hesin, Heval, Hewran, Hezar, Heyif, Heyrano, Heyveran, Hêjar, Hêlîn, Hêman, Hêrîş, Hêşû, Hêvî, Hînar, Hingur, Hîrço, Hîşar, Hîşyar, Hînkâr, Hodo, Hogir, Hopo, Hoşîn, Hovnê, Hoycan, Hozan, Hozê, Hurê, Hurik, Huşeng, Hurmiz,

I

Ihsan, Iskan,

Î

Îkram, Îpal,

J

Jan, Jîn, Jînê, Jîndar,

K

Kakilo, Kako, Kamuran, Kanî, Karker, Kaşo, Kawa, Kejê, Kekan, Keko, Kemîn, Kendal, Kereng, Keser, Kesro, Kevok, Kewê, Kewzan, Keya, Kezî, Kezo, Kinê, Kîndar, Kulîlk, Kurdê, Kurdistan, Kurdo, Kurmanc, Kûrzan,

L

Laleş, Lalo, Lawîş, Lalê, Leşker, Lezgîn, Lezgo, Lêrê, Lolîxan, Loqman, Lola, Lorî,

M

Malî, Malo, Mamîr, Mamo, Mehdi, Mehdîxan, Mehdîyan, Melo, Mem, Memo, Mencê, Mencol, Menîce, Mercan, Merîwan, Merwan, Merê, Meymo, Mezin, Mêrxas, Mirarî, Mişkê, Mizgîn, Mîdya, Mîr, Mîro, Mîşo, Momê, Mûmin, Murik,

N

Nacîme, Nado, Nalîn, Narê, Narînc, Nas, Nasdar, Nazdar, Nazenîn, Narê, Narîn, Naro, Nazo, Nebez, Nelmal, Nermin, Neslîxan, Nesrîn, Newal, Newîn, Nevîn, Newroz, Nexşîn, Nezan, Nêçîr, Nêrgîz, Nigar, Nihil, Nizar, Nîşe, Nuner,

O

Ôldar, Olo, Omo, Ortas, Otê,

P

Pale, Paqij, Pehîz, Pejink, Perîşan, Perîxan, Perîzad, Perwîn, Perwîz, Pêkhat, Pêkol, Pênus, Pêşeng, Piling, Pîran, Pîrşeng, Pîsmam, Pîroz, Porqul, Poro, Porsor, Posî, Potê, Pozo,

Puşî, Pûşê, Pûrto,

Q

Qajo, Qasid, Qehfûr, Qekîn, Qenco, Qerê, Qerno, Qesem, Qeşem, Qêrîn, Qîwar, Qoço, Qubat, Quling, Qulîxan, Qumrî,

R

Reben, Remo, Reş, Reşxan, Rewşen, Rewşê, Reyxan, Rezo, Rezvan, Rêber, Rênas, Rêwî, Rindê, Rindo,

Rizgar, Rizgo, Rîpê, Rîsor, Robar, Rojen, Rojhat, Roja, Rojda, Rojîn, Rohat, Rojvan, Ronahî, Ronak, Rûken,

S

Sado, Salar, Segman, Segvan, Senem, Seno, Serbest, Serçil, Serdar, Serdeşt, Serdil, Serê, Serhat, Serket, Serqol, Sertac, Sertîp, Serxan, Serxwebûn, Seydê, Serwer, Serwet, Seyrê, Sêqul, Sêcê, Sêvê, Sîyehpûş, Silêr, Simko, Sino, Sisê, Sîsin, Siyabend, Siyamend, Sînem, Sînemxan, Sixur, Solav, Sonê, Soran, Sorgul, Sorê, Soro, Sosin, Siwar, Suwar, Sûlav,

Ş

Şabet, Şahî, Şayeste, Şekir, Şekîrê, Şekiro, Şimamo, Şemamo, Şemê, Şemdîn, Şemşûl, Şengê, Şengo, Şeno, Şerbo, Şermin, Şerker, Şermo, Şewat, Şewqî, Şewrê, Şêro, Şêrwan, Şêrwan, Şibo, Şivan, Şilan, Şîrê, Şîrîn, Şîrvan, Şoreş, Şoxê,

T

Tacdîn, Taco, Talo, Tavîn, Tazo, Tembûr, Temîr, Temîrxan, Temo, Terho, Teto, Tevger, Tewger, Teyrê, Teyro, Teyrok, Têkoşer, Têlî, Têlo, Têmûr, Tiro, Tîrêj, Tîro, Tolo, Torî, Toro, Tozo,

U

.....

Û

Ûcê,

V

Vêno, Vito, Viyan,

X

Xaço, Xakî, Xandan, Xanê, Xanim, Xano, Xanzad, Xatûn, Xebat, Xecê, Xeco, Xelat, Xelaskar, Xemlê, Xemê, Xemgîn, Xemşê, Xemrevîn, Xerî, Xewê, Xezal, Xizan, Xizem, Xoşeng, Xoşnav, Xumal, Xumar, Xûnav, Xwas, Xwaz, Xwî, germ,

W

Welat, Welo, Wenda, Wendo, Wesîla, Wêran, Wirya,

Y

Yadê, Yadin, Yado, Yarê, Yawer, Yekane, Yekbûn, Yekîtî, Yekta, Yezdan,

Z

Zana, Zaza, Zelal, Zend, Zerê, Zerî, Zernîşan, Zevî, Zeyno, Zêrê, Zêrî, Zimzim, Zinar, Zîn, Zînê, Zîze, Zozan, Zozik,

15 ROJ

GRÊW LJ

BEŁÇÏKA

Belçika yek ji welatên Ewropa ye ên ku ji giranbûn û kûrbûna krîza aborî pirr dikişîne : bêkarî, behabûn, her roj bêtir dibin. Loma, hikumetê projekî malî ya nuh, ji bo sala 1983-1984 derxist. Ji bo ku malîya xwe ya qels xurttir bike û karibe 10 milyar frengên Belçikî (îktisad bike) ew dixwaze ku mafên karker û memûrên dewletê, bi hêzanî ên ku di trênan û otobûsan de kardikin, kêmkirina mafên ku karker bi zorê standibûn, weka mafê teqaûdîyê û prim... Lê gelên Belçika dijî rêzana civakî ya hikumetê zû derketin. Di meha Îlonê de, 15 roj li pê hev grêvên pirr mezin û giştî jîna Belçika seht kirin. Li jêr emê derbasbûna grêvê, ji destpêkê heta dawiyê, nîşanbidin.

Roja Îne 9/9/83 : Li bajarê Charleroi, li Wallonie, grêvekî nişkavî û serbixwe, ango bê emr û tertîbên sendîkan, ji aliyê karkerên trênan destpêdike û digehêje çend bajarên din ên Wallonie. Paşê her du sendîkên CGSP (Sosyalîst) û CCSP (Katolîk) vê grêvê îdare dikin. Li aliyê Flandre, bi tenê liqên Oostende û Kortrijk grêvê dikin.

Duşem 12/9/83 : Grêv digihêje hemû stasyonên Wallonie û çend stasyonên Bruxelles. Li her der, sendîka civînanên informasyonê çêdikin. Li Charleroi, berpirsiyarên sendîka grêva giştî, di hemû dayirên hikumetê li her derê Belçika îlan dikin.

Sêşem 13/9/83 : Grêva giştîya karkerên otobûs, metro û poste...

Çarşem 14/9/83 : Bazohekî civakî hemû dairên hikumetê seht dîke û Welêt bi carek tev li hev dîke. Her sê sendîka: sosyalîst, katolîk û lîberal amadekirina grêvekî giştî; du rojan, ji aliyê hemû şagirtên hikumetê, heta mamustan jî pêşkeş dikin.

Pêncşem 15/9/83 : Grêvekî pirr fireh : otobûs, metro, trênan, poste, dibistan, dayirên beledîyan û wezaretan kar disekinînin.

În, Şemî 16 û 17 /9/83 : Firehbûna vê grêvê hikumetê şaş dîke. Loma pêşnava dîke ku bi berpirsiyarên grêvê re li ser malîya 1984 bipeyivin. Her du alî (hikumet û grêvist) çekên xwe li kar tînin; hikumet mafê biryar standîna sendîka dirêjbûn û frehbûna grêvan. Civînanên nav her du alî pirr zor derbasdibin. Sebra sendîkayên ticarî (bazarî) jî kêmkirina hikumetê çavtirsandî dikin ku ew jî têkevin grêvê.

Yekşem 18/9/83 û duşem 19 : Piştî 20 seet axaftin bi hikumetê re, her sê sendîka bi awakî vekirî pêşneyara hikumetê ji bo îktisadkirina 8,3 milyar freng (dêlva 10 milyar) red dikin. Van sendîkên ku bingehen wan wan daahfididin prensîpê îktisadkirin bi xwe red dikin. Lê hikumet, ji aliyê xwe, xwe nerm dîke û alternatîvan pêşneyar dîke.

Sêşem 20/9/83 : Grêv digihêje meydana balefiran. Sekinadina kar di trênan, otobûs û postan de destpêdike; xebata hinek fabrîkan û dayiran tev li hev dîke.

Çarşem 21/9/83 : Axaftin bi hikumetê re ji nuh de vedibin : neh seet da - jon. Grêv dewam dîke.

Pêncşem 22/9/83 : Têksta li berhevhatinê ewê her du sendîka Katolîk û lîberal vê pêşneyarê li ber têkoşerên xwe biparêzin. Sendîka sosyalîst, CGSP, roja Îne ewê komîta xweya fireh bicivîne. Piştî civînan van sendîkan bi endamên xwe re û bi şertê ku grêv bisekine, hikumet ewê vê teksta li ber hevhatinê derxîne. Di vê tekstê de, hikumet hinek tawîzan dide, bi hêzanî li ser diravê teqaûdî û prim.

În 23/9/83 : Sendîkên Katolîk ên trênan, poste, û PTT, bê keyf, biryar distînin ku grêvê bisekinînin.

Şemî 24/9/83 : Hemû sendîka tevî yê sosyalîst, pêşneyarên hikumetê qebûl dikin û grêvê disekinînin. Heta dawiyê, civînan van sendîkan bi têkoşerên xwe re pirr zor derbasdibin. Di destpêkê de, karkeran bi awakî serbixwe bê sendîka dest bi grêvê kiribûn. Lê merivên bi hikumetê re peyivîn ne ew bi xwe bûn, serokên wan bûn.

Eger berpirsiyarên van sendîkan xwe qels nekirina ewê hikumet bi xwe biketa. Lê mixabin, sistbûna her du sendîkan ên Katolîk û Lîberal û neketina sendîkên ticarî nav vê grêvê, sendîka sosyalîst pirr qels kirin û nehiştin armanca grêvê biçe serî.



DÎROKA KURDISTAN

TORÎ

Dîroka gelê Kurd dirêjî berî îsa bi deh hazar sala dibî. Pêşiyê wa Mad, bi gelê wek xwe ji hîmê Arî hatî, pêşî ji baqura Ewropa hatin û li dora çiyayê Zagros bicîh bûn. Berî îsa di qirnê dehemînde ji wir daketî bakura rojhilata Irana îroj. Navê xwe dane wî cihî. Wêdê bi navê Madya bi nav kirin. Dewleta xwe saz dikin. Geh bixweser, geh li cem dewletna cih digrin û bi dewletê dinra şer dikin. Dewleta tevlu çande wan ji hola dîrokê radikin. Alfaba xwe î Zend pêktênin. Pirtuka xwe Zend-Aveste î olâ Zerdestî bi wê alfabê dinivîsin. Heta pejirandina misilmantîyê bawerîya xwe bi Zerdestî tînin. Dewleta wan jî, ji alî dewlet na tê rakirin. Qederekî di çiyayê xwe î azadde dijîn. Pêjin ji wan nayê. Di vê navîyêde xwe didin hev. Ji nûve liberxwe didin. Ji nûve dewletê xwe pêktênin.

Heryek ji van bûyera ko di jîyana Kurdade bihûrî, bixweser dîrok in. Ev dîrok, ji ber ko alfaba Kurda hebû, bê nivîsandin neman e. Bi destê Kurda bixwe hatîye nivîsandin. Di van hazar salande Kurd têkilî bi dewleta Farisa, Aşurîya, Urartuya, Mekedonya, Roma, Selçuqîya, Ereba, Osmanî ya, Tîmur û Xulagu xan kirin e. Ew jî dîrokê xwe nivîsandin e. Ji ber ko têkilî bi Kardara kirin e, bi taybetî, ew jî di dîrokê xwede qala Kurd û Kurdistan kirin e. Ji xeynî Faris, Ermenî, Tîrk û Ereb, dewletê din, tevlu gelê xwe ji hola dîrokê rabûn e. Kanî Asurî

ko heta Lubnana îroj, heta bajarê Qeyserî çuyî. Li wada navenda bazirganîya xwe danî û tev dewlemendîyê wada kêşandin welatê xwe. Bi hazaran kes kuştin. Ji şermê wan kon, ji serê wan kelih çêkirin e. Ka Deqnenos "Iskender" ko ji Mekedonya heta Hindistan çuyî. Cihê têde bihûrî kambax kirî. Ka Urartu ko kevnareyê çanda wan heta îroj dimînin. Ka Tîmur ko Osmanîya bindest ki rî û padîşahê wan Beyazî xistîye rekkîhekî û cihê ko çuyê bi xwere gerand. Ka Xulagu xan ko heta Bagdayê daket û cihê ko têde bihûrî kambax kir. Lê dîrokê xwe, ew li ser kevîra, ew li ser kerpîçê pijandî û bi sadan pirtûk, ew berdest, ew binax bin, gihandine roja me. Lê sad heyf û mixabil û sad hawar, di nav vaqa gelê ko di dîrokêde têkil bi gelê Kurdra kirî, dîroka wan xwîya ne, yê gelê Kurd ko îroj hejmara wan ser bist melyonî dikevî, welatê wan Kurdistan 520 hazar Kîlometir çarçik li ser ruwê cîhanê cih digrî, bitenê dîroka wan di holêde xwîya nakî. Yê heyf jî, hejmara wan bi deha tî hejmarê û li buwara dîroka Kurd î rast gelek vêl û sivîk dimînin. Gelo kengî wê dîroka Kurd ko hatî nivîsandin ji binê axê, ji pirtukxane û kevnarexanê dexletê emperyalîst û bikevin destê me Kurda. De em jî bêjin gelî gelê cîhanê, ji xwe em hene, lê va em ev in. De zarowê me paşerojê xwe qenc fêrbibin. Têkoşîna gelê Kurd ko di hazar salande dayî nasbikin. Têkoşîna pêşerojê xwe ser wî bin-

gehî ava bikin.

Dema ko yek bivê ko ser dîroka Kurd û Kurdistan bi axivî an nivîsandînekê amade bikî, pêwîste ko pirtukê di vê babetêde hatî nivîsandin bixwenî. ^{Kurd Kî ne.} Kurdistan ku der e. Dîrokzahê Kurd û biyan di vê babetêde çî nivîsandin e. Hey ên Kurda nînin, kevnarenasê biyan kîjan kevnareya jî binê axê derxistin e. Di wan kevnareyade ser Kurd û Kurdistan çî hatîye nivîsandin. Vana tev bixwenî. Piştra axaftina xwe bikî an nivîsandina xwe bînvîsî. Bêyî vana axaftina ko hatî kirin an nivîsandina ko hatî nivîsandin an daraw a, an li buwarî dîroka Kurd û Kurdistan î rast gelek vêl û sivik e. Ji Kêmayî tiştekî nû nayênî.

Ev nivîsandina me jî bi taybetî tiştekî nû nayênî. Dilopik jî dîroka Kurda ye. Em hêvîdarin ko ev dilop kêrî nûjenkirina zaneyîya we xwendekarê berêz bê.

Emê jî Mada dest bi nivîsandina xwe bikin. Ji ber ko bûye dîrok, di komara Mahabatda biqedênin. Gelê ko têkilî bi Kurdara kirine ser navê Kurd û cihê wan di dîrokê xwede çî gotin e. Têkilîya Kurda di sad salande bi gelê dinra çî ye. Emê li ser wa rawestin.

Navê Kurd :

Dîrokzanê rojhilat jî dîrokê van gelan de li ser navê Kurd ev nav derxistin e.

Aşurî û Aramî : Gotî, Kutî, Gortî, Kârdō, Kârdakā, Kardan, Kardok, Kirho.

Faris : Kortiyō, Sirti, Korhaha.

Yunan û Rom : Kardosuy, Kardak, Kardohî, Kardahay, Kardohuy.

Ermenî : Kardoin, Korçih, Kortih, Kerhi, Korhi, Kurdocih.

Çerkez : Kurtçiko.

Ereb : Kurdi, Kardoyî, Bakarda, Curdi, Cudi, Ekrad.

KURDISTAN :---

Dîrokzanê rojhilat tuxubê Kurdistan bi vî awayî nîşan kirin e. Bi taybetî ev tuxub, li gora têkilîya gelan û dîrokzana bi Kurdara ye. Kîjan gel an kîjan dîrokzan, di kîjan heymî li ku têkilî bi Kurdara kiribî wê tuxubê Kurdistan bi vî awayî nîşan bikî. Dema ku me ev tuxuba li ser hev kir, tuxubê Kurdistan zelal nebî jî wê bi groverî bê nîşankirin.

Aşurî : Ji rojhilat, gola Urmîye, Rojavā çîyayê Qardo (Cudî) û robara Dîjle, Bakûr çîyayê Ararat. Başur, destpêka herdu robarê zab.

Dîrokzan Sen Martîn : Rojhilat Ermenîstan, Rojavā Bûra-Mûg (Muş) Bakur vaspurkan, Başur Aşurî

Dîrokzan Norman : Ji deryaya Kazvîn hefta Basra.

Dîrokzan Major Frederik Millingin : Hekkarî cihê dora Hekkarî.

Piştî rakirina dewleta Aşur û Urartu :

Rojhilat Bahreyn, Rojava robara Kızıllırmak, Bakur deryaya Kazvîn, Başur Basra.

Di dema Osmanîyade : Rojhilat tuxubê İran, Rojavā xeta ko dadikevî başura Iskenderun, Bakur çîyayê Ararat, Gurcîstan û Lazîstan, Başur tuxubê Bexda.

M A D :---

Gelê ko jî hîmê Hint-Ewrûpa tên di sad sala IX-X an de ji başura Ewrûpa tên li dora çîyayê Zagros û deryaya Qazvîn bicih dibin. Ew gel Mad, Lulu, Gutî, Kasayî, khaldî, Faris, Manî, Sîs û Kîmrî bûn. Di nav van gelan de yê xurt Mad bûn. Mad piştra jî wir dadikevîn dora gola Urmîye. Piştra li welatê xwe î Mad ya bicih dibin. Pişt wanra Faris, Manî Sîs û Kîmrî dadikevîn. Manî Sîs û Kîmrî tevlu Mada dibin. Di nav wande dihelin. Li wir Mad û Faris dimînin.

Navê Mada di nav wan gelande Med, Mad, Amad, Mid û Miyd dihad gotin. Gelê Mad di rîsta eşirtîyê û bi koçerî dijîn. Subarî, Hurrî, Mîtanî û Qardo jî wan eşîra î mazin bûn. Ew eşîr di nav xwede dewleta saz dikên. Subarî li Hekkarî û Şemînan, Mîtanî li nav robarê Xabur, Belih dijîn. Mîtanî li wir, berî Isa di sala 1500 de dewleta xwe saz kirin.

Subarî jî ber ko cîranê Aşurîya bûn di nav wan de şerne dūr û dirêj çêdibî. Di nêzîkî talîya Aşurîya de, navê Subarîya jî holê dirabî, navê Nayrî derdikevî holê. Xwîyaye ko Nayrî bavîkî jî Subarîya bûn. Seroktî gihastîye destê wî bavîkî.

DAMEZRANA

Rast axaftin, rast nivîsandin û xwendin di zaneyîya zimande dibuhûrî. Hege di wan sedemende çewtîyê me hebin, ji nezanîya me yî damezrandina ziman derdikevî. Nexwe, divê berî her tiştî, em zimanê xwe nasbikin. Eneq naskirina damezrandina ziman wê me serrastî, rast axaftin, nivîsandin û xwendinê bikî.

Heta nûha zimanzanê me yî berêz, di pirtukê xwede damezrandina ziman ji xwere kirine sedem. Lê ne daketine kurayîya sedemê. Vêl hiştin e. Ji ber vê yekê jî em têgiheştî damezrandina zimanê xwe nebûne. Lê ne ewe ko wê sedem ji rewşa xwede bimînî. Divê ko em ji cihê ko hustayê me destpêkirî, destbavêjinê û li ser bi giringî birawestin. Bi vê yekê em bawerîn ko emê sipartinka giring li buwarî zimanê xwe pêkbeyînin.

Beşa yekemîn :

Sedem : WÛŞE

Wûşe endamên hevoka ne. Bixweser ramanê wan hene û kêra sazkirina hevoka tên.

Texlîtê wûşa :

1. Wûşeyê yekkîte.

Wûşeyê ko ji kîtekî çêbûn e. Wek : dev, qal, bal, hişk.

2. Wûşeyê pirkîte :

Wûşeyê ko ji du û bêhtir kîta çêbûn e. Wek : Aza, aştî, bendevan, desthilanîn.

3. Wûşeyê hesa :

Wûşeyê ko bixweser in. Bê arîkarîya wûşene din an guherkerê pêşdanî û guherkerê paşdahî çêbûn e. Wek : heval, mêhvan, mezal, welat.

4. Wûşeyê hevedudanî :

Wûşeyê ne bixweser in. Bi arîkarîya wûşene din û guherkerê pêşdanî û paşdanî çêbûn e.

Bi vê damezrandina xwe Kurdî dikevî nav koma zimanê Îndo-Ewropî.

Wûşeyê hevedudanî bi van endaman damezran e.

1. Guherkerê pêşdanî,

2. Guherkerê paşdanî,

3. Guherkerê pêşdanî û paşdanî,

4. Du paşdanî,

5. Du nav,

6. Nav û rengdêrînik,

7. Du rengdêrîn,

8. Nav û lêkerik,

9. Daçek û lêker,

10. Daçek, nav û lêker,

11. Rengdêrîn û lêker,

12. Pêşdanî, nav û lêker,

13. Du pêşdanî û nav.

Çêbûna wûşa bi guherkerê pêşdanî:

bê : _

Nîşandek:

Rêza yekemîn : dil, bav, rû, ser, teqil, zirav, rist, dad, deng, hedar.

Rêza duyemîn : bédil, bêbav, bêrû, bêteqil, bêzirav, bêrist, bédad, bédeng, bêhedar.

Têgiheştin: Wûşeyê rêza yekemîn, wûşene hesa... û texlîtê navande ne.

Wûşeyê rêza yekemîn, di rêza duyemînde pêşdanîya " bê " sitandin e.

Bi sitandina "bê" navê rêza yekemîn çawankîyê xwe nîşan dîkin.

Bi nîşankirina çawankîyê xwe, ji texlîtê nava derketin e, wergerîyan e texlîtê rengdêrîna. Wek : kesê bédil, kesê bêbav û hnd.

Wûşa "bê" û guherkera "bê" di hevokarde sipartinkê pêknayênin. Wûşa "bê" di

ramana " der " de ye. Ramana derî kirin û bûyinê ko di hevokande hatî nîşan-

kirin, nîşan dîkin. Guherkera "bê" weke ko me li jor dîtî, rewşa nîşan dikî. Wûşa

"bê" di hevokande bixweser tê nivîsandin. Wek : Xebata xwe bê gotin bikin. "bê"

di hevokêde ramana derî gotinê nîşan dikî. Di deverekî din de Wûşa "bê" sipartina lêker pêktanî. Wek : Bere ew jî bê.

Bi : _

Nîşandek:

Rêza yekemîn : arz, çek, ber, deq, şan, semax, zaro, hay, kul, xem.

Rêza duyemîn : biçek, biarz, biber, bişan, bisemax, bizaro, bihay, bikul, bixem.

Têgiheştin :

Wûşeyê rêza yekemîn, wûşene hêsa: . . . û di texlîtê navande ne.
Wûşeyê rêza yekemîn, di rêza duyemînde pêşdanîya "bi" sitandin e.
Bi sitandina " bi " navê rêza yekemîn çawankîyê xwe nîşan dikin.
Bi nîşankirina çawankîyê xwe, ji texlîtê nava derketin e, wergerîyane texlîtê rengdêrîna. Wek : Kesê biçek,tiştê bideq,kesê bişan û hnd.
Wûşeya " bi " û guherkera " bi " di hevokande sipartinkê pêknayênin.
Wûşa " bi " daçek " edat " e. Ramana bihevrebûnê nîşan dikî û di hevokande bi-xweser tê nivîsandin. Wek : Te bi vî karî xwe eşand.
Ji alîkî din, pêşdanîya " bi " tê ser bingehê lêkera û bi wanve dizeliqî.
